Lê bi heman rengê wê, dema ku wê şer bidomê de jî wê, balafirên şer ên artîşa tirk wê bombananê şitt û dijwar wê li herêmê wê bikin. Bi teybetî herêma cindirêsê wê, di destpêka sibeha 21û sibatê de wê were bombardimankirin heta ber êvarî. Wê hemû dever, gund û çavçeyên afrînê ên reco, cindirêsê, sîyê û hwd wê, bombardiman bikin.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, ji herêm bi herêm wê hem ji bejehiyê ve wê li wan hêrîş wê werina kirin û pêşxistin û hem jî wê ji hewa ve jî wê, ew hêrîş li wan wê werina pêşxistin.

Di vê pêvajoya hêrîşên li dijî afrînê de ku wê, pêvajoya berxwedana kurdistanîyan li afrînê wê heyvekê li şûn xwe wê bihêlê wê, bi wê re wê, ew temenê wêretîya derxistina dengên cûr bi cûr ji gelek deverên din ên cihanê jî bê. Wê, ev pêvajoya berxwedanê ku ew çendî ku ew dirêj dibê wê, zêdetirî wê bikeve rojeva gelek kesan de. Wê di roja 21ê sibata 2018an de wê, kesên weke Tomas benedîktor ji Îtalya ên aqadamîsyen û aborîvan wê bangê li rayagiştî a navnetewî ku ew li dijî hêrîşên li ser afrînê bêdeng nemênin û wan bidina rawastandin. Wê ji roja destpêkê wê kurdistanî wê li pêşîya seferetxaneyan û parlamen û qadên jîyane wê dagirbikin û wê xwepeşandinên şermazarkirina hêrîşên li dijî afrînê wê li darbixin.

Wê di heman rojê de wê, berpîrsê serokê netewên yekbûyî **Antonio Guterres** ê bi navê Stephane Dujarric wê bi civîna li çapameniyê ku ew li dardixê wê bangê bikê ku oparasyonên li dijî afrînê werina dawî li hanîn. Wê ji rojnemavanê rojnemaya firansî *la figaro* **Gerard chaliand**(*) wê, dema ku wê berxwedana afrînê wê heyve xwe wê tişî bikê wê di nivîsa ku ew dinivîsênê de wê, werênê li ser ziman ku *”ÖSO’ya tirkan wê, ji bermehiyên DAÎŞê û pê de ne ti tiştê din bê.”* Wê nivîsa xwe bi sernavê *”muharebeya afrînê û xîyaneta rojavayîyan li kurdan”* wê, ragihanê. Di aslê xwe de wê, ser navê nivîsa Gerard wê, sernavê wê, ji gelek aliyên ve wê rewşê wê bi sereka bikê û wê bi sereka wê karibê werênê li ser ziman bê. Di rastiyê de wê, weke ku wê Gerard chaliand wê dinivîsa xwe de wê, werênê li ser ziman wê li berçavê hemû cihanê wê bi rojan ew hêrîşên xadar, hov û şitt wê li herêmên kurdan ên weke afrînê wê bibin. Wê zêde wê, ji dem bi dem wê bo ku ew xwe ji berçav xirab dayina nişandinê xilasbikin hanîna li ser ziman a çend gotinan û pê de wê, rewşa bertekan wê derbas nebê. Di vê çerçoveyê de wê, di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Fîlosofê fransîz wê Bernard-Heny levy wê, di 9ê sibata 2018an de wê di nivîsa xwe ya di **”wall street journal”** wê, ragihênê ku *”T. Arogan, qatil a.”* *”paqijîya etnikî dikê.”* **Bêgûman wê ev gotinên Levy wê weke rastîyna ku ew pîrr dereng hatî li ser ziman bin.**

Wê di dewama wê de wê gelek sazîyên ewropî û cihanî wê bangê bikin ku ew hêrîşên li dijî afrînê werina rawastandin. Wê di dewama wê de wê, weke aliyekê din ê girîng wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, rayadarên tirk wê li ti bangê jî wê gûhdar nekin. Wê bînavber wê hêrîşên xwe wê li rojava û afrînê wê bidina domandin.

Di aslê xwe de wê, mirov dikarê werênê li ser ziman ku wê, ne hildana li cidîyetê a bertekan ji aliyê rayadarên tirk ve wê, ji aliyekê ve wê temenê wê bi rengê sîyeseta welatên ewropî û tîkîliyên wan ên bi wê re wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Di aslê xwe de wê, wê, pêvajoya berxwedana afrînê wê, ji aliyekê ve wê, rûyekê din ê ewropa û sazîyên wê jî wê bide nişandin. Di pêvajoya 40 salê bûhûrî û ankû derbasbûyî de li bakûrê kurdistanê li hemberî hemû komkujiyên ku artişa tirk li ser serê civake kurd kirin û bi dehan bajarên wê ên weke cizira bota, nisêbîn, gever, farqîn, sûr, silopî, şîrnax û hîrd rûxand û kavilkir û li hemberî wê bêdeng man wê, di vê çerçoveyê de wê, rayadarên tirk wê wê rengê derxistina li hemberî hêrîşên wê yên li dijî afrînê wê, weke wan bêdengîyên li hemberî

(*)Nivîskarê la figaro

wan hêrîşên li wê yên li kurdên bakûrê kurdistanê bixwênê û wê ne hilde li cidiyetê. Di vê çerçoveyê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Di aslê xwe de mirov dikarê wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, ew bêdengî wê, temenê domandina wan komkujiyan bê. Wekî din wê ew bêdengîya li hemberî komkujiyên rejima tirk û artişa wê ên li bakûrê kurdistanê wê temenê wêrekirina wê ya di hêrîşên wê yên li dijî rojava û afrînê de jî bê. Di vê çerçoveyê de wê, heta roja me wê, bi awayekê wê her komkujiyê wê li berçavên wan wê bikê. Di vê rengê de wê, ew wê bidomênê. Ji xwe ew jî û ankû rayadarên tirk jî wê, hêrîşên xwe yên li dijî afrînê wê dewama hêrîşên wê yên li bakûrê kurdistanê ên li civake kurd de wê werênê li ser ziman. Di aslê xwe de wê, ev rast jî bê. Ev hêrîşên ku ew li rojava û afrînê dikê wê, di dewama hêrîşên wê yên li bakûrê kurdsitanê de jî bin.

Ji aliyekê din ve jî mirov dikarê wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê hêrîşên rejima tirk ên li bakûrê kurdistanê û li rojava û ankû li afrînê jî wê, temenê wê yê bi têtikiliyên wê yên bi amarika û rûsya re jî wê hebê. Rewşa li hemberî hevdu sekinîna rûsya û amarika wê, tirkiya wê derfetê ji wê re wê çêbikê ku ew ji aliyê van herdû hêzan ve werê bikarhanîn. Ew jî wê, rewşa bikarhanîna xwe wê, çawa wê wergerênê li rengekê ku ew bi wê derbeyê li kurdan bixê wê, li ser wê bisekinê. Di hemû salên berê ên ku wê derbaskirin de wê, gotinên weke "têtikiliya stretejîkî" a bi amarika re" ku wê bikarbênê wê, çawa wê, li ser wê re wê, rewşa kurd û şerê wê yê bi kurd re wê, bi wê ji wê sûdbigirê wê, li ser wê bisekinê. Di dema piştî 15ê sibate 2018an de çûyina li tirkiya wezirê karê derve ê amarika Rex Tillerson wê, piştî hevdîtina bi sê seatan a ku wê di navberî û rayadarên tirk de wê bibê de jî wê, bi çend gotinan ku wê ragihênin wê ew wê gotina "têtikiliya stretejîkî" û ankû "muttefikê stretejîkî" wê bikarbênin. Di vê çerçoveyê de wê, wûcana xwe wê, rejima tirk wê hertimî wê bi firoşê ku ew çawa karibê li ser wê re wê şerê xwe yê bi kurdan re ew bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa têtikiliyên wê yên bi amarika, yekîtiya ewropa û NATO re jî wê, di vê çerçoveyê de bê. Di rewşa têtikiliyên xwe yên bi ewropa re wê rewşa berendamiya xwe ya li ewropa wê weke rewşeka bikarhanînê wê bikarbênê. Wê li ser wê re wê, alikariyên aborî, sîyesî û dîplomatîkî û hwd wê, bikê ku ew bistênê. Di vê rengê û awayê de wê, di awayekê sergirtî de wê, ev ewropa ewropa, amarika, NATO û hwd wê, weke aliyekê li "dijî kurd" wê çawa wê bêtênasekirin û wê li ser wê re wê, kurd wê werina krîminalizekirin wê, bikarbênê. Kirina rêxistinên kurdan ji aliyê amarika û yekîtiya ewropa ve li listeyên terorê' de jî wê, di encama wê rewşê de wê were pêşxistin. Weke aliyekî din jî wê jî mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, tirkiya wê, bi çekên ku ew ji welatên ewropa ên weke almanya, firansa û hwd dikirê wê li dijî kurdan bikarbênê. Wê tankên almanan wê biajoyê bi ser afrînê de. Di hêrîşên wê yên li bajarên bakûrê kurdistanê de jî wê, ew tankên almanan wê werina bikarhanîn. Lê wê, newina hanîn li rojevê. Li şûna ku wê, ew wê werina li rojevê wê kurdan krîminalize bikin. Di aslê xwe de wê, aliyekê wê krîminalize kirina kurdan a li welatên ewropa ên weke almanya wê bi wê rewşa firotina çekan li tirkiyê û bi karhanîna wan a li dijî kurdan ve girêdayî wê hebê. Wê ji kîjan aliyê ve wê hebê? Wê, ji wê aliyê ve wê hebê ku wê, dema ku ew kurdan krîminalize û terorîze nekin û wusa nedina nişandin wê, ew bi wê çekên wan ên ku ew di firoşina tirkiya û bi wan kurd dihên qatilkirin wê ew xirab werina dîtin. Bo ew ku nekewina wê pozisyonê de wê, li şûna wê, rêxistinên kurdan wê bidina nişandin weke 'rêxistinên terorê'. Xwepêşandinên kurdan wê di wê çerçoveyê de

wê hêrîşî wan bikin û wê krminalize bikin. Ji aliyekê din ve jî wê, di vê çerçoveyê de wê, temenê wê pîrsgirêkê bi awayekê pîr dijwar wê çêbikin.

Di pêvajoya hêrîşên rejima tirk ên li dijî afrînê de wê tenê konteynirên tişî çek ku wê ji kevîyên almanya wê werina şandin li tirkîya wê, bi dehan û sadan bê. Wê ew çek hemû wê li li dijî kurdan hem li bakûrê kurdistanê wê werina bikarhanîn û hem jî wê li rojava û afrînê wê werina bikarhanîn. Ber vê yekê ya ku wê, wê rayadarên alman wê, hêrîşên rejima tirk ên li dijî afrînê wê bi gotinên weke "meşrû" wê werênina li ser ziman. Wê, di vê çerçoveyê de wê, dema ku ew wan hêrîşan bi rengêkê nemeşrû werênina li ser ziman wê, hingî wê, ji wan bê pîrsîn ku di wê rewşa ne meşrû de çekên alman dihên bikarhanîn. Ew jî bo ku ew ser wê ji aliyê xwe binûxûmênin wê serî li rengên ragihandinên bi vî rengî wê bixin.

Ji aliyekê din ve jî minaq qadaxakirina dagerên civake kurd li almanya ji kurdan re û her wusa qadaxakirina li darxistina xwepêşandinan bo şermaxarkirina hêrîşên li dijî afrînê ji aliyê kurdistanîyan ve li almanya wê, di vê çerçoveyê de wê temenekê wê yê bi sîyeset û zihniyeta wê ya ku ew di cewherê xwe de ew ji bandûra neonazîtîyê xilas nebûya re wê, hebê. Di vê rengê û awayê de wê, di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Ber vê yekê wê, pêvajoya şerê li hemberî civake kurd li kurdistanê ên van rejimên weke rejima tirk û bédengîya rayadarên welatên ewropî wê hinekî wê, ji vê aliyê ve wê, temenê wê hebê. Ji aliyekê din ve ew di aslê xwe de dixwezin ku tekoşîna kurd were tafisandin. Ber çî wê dixwezin? Ber ku wê dema ku ew newê tafisandin û bi serkeve wê, were dîtin ku ew ser 40 salî û re ya ku artîşa tirk bi çekên wan hêrîşî civake kurd dikê û komkujiyan pêkdihênê. Di dewama wê de wê werê dîtin ku ew ser 40 salî re ku ew pêvajoyên hêrîşan li civake kurd dikê rejima tirk. Wê bi wê re wê were dîtin ku ew jî ev 40 salên ku ew li berçavên wan ew komkuji û pêvajoyên hêrîşan hatina pêşxistin û wan li dijî wan bertek nedana nîşandin. Wê ev wê mirovatiya wan jî wê bikê berpîrsînê de. Ew tenê bo wê jî bê ew dixwezin ku kurd werina şikandin. Yan jî di rewşek bêstatû de werina hiştin. Ber çî wê dixwezin? Ber ku kurd statûyek kêr jî bistênin wê, piştî wê, dema ku wê, dîroka wê were nivîsandin wê, ew dîroka komkujiyên ku ew li berçavên hemû cihanê bi dehan salan hatina pêşxistin û bi sed hezaran kurdistanî ku ew li berçavên hemû cihanê hatina qatilkirin û ew li hemberî wê bédeng mana wê, ew wê were dîtin. Ber çî pîrsgirêka naskirina tevkuji û ankû jenosîda ermenîyan bi awayekê fermî heta roja me nayê qabûl kirin. Gelo ev tenê di encama dîplomasiya rejima tirk de ew pêşîya wê dihê girtin? Na, ew ne tenê ya. Bi wê re wê ev aliyên din ên ku wê, bi alîkarî û ankû bi rewşên bédengî ên di demê de li hemberî komkujiya ermenîyan ku weke ya kurdan îro didina nîşandin ku wan daya nîşandin ew di temenê wê de ew heya. Her wusa çendî ku wê bi ser komkuji û jenosîda cihûyan de ev 55 sal zêdetir jî derbas bûna lê hê ew bi heman rengê di reng û awayekê ji berçav dûr girtin û ne hiştina were nasîn de wê, dîsa wê heman rewş wê hebê. Li vir di aslê xwe de wê, gelek rewşên weke wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman wê hebê. Zihniyeta ku ew hatî pêşxistin û hatî birin li herêmê û li herêmê hatî îxreckirin wê, pêşî xalkên weke asûrî, keldanî, ermenî, cihû, êzîdî û hwd wê tûna bikê. Î ro jî ew kurdan bi pêvajoyên şer ên pîrralî dikê tûnabikê. Pêvajoyên hêrîşên li kurdan li hemû beşên kurdistanê, di vê çerçoveyê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, aliyekê wê yê zihniyetî jî wê hebê ku mirov wê kifşbikê û wê werênê li ser ziman. Di pêvajoya referandûma başûrê kurdistanê de ku wê, bi awayekê weke 'hemû dînya' wê li dijî wê bê, gelo wê weke ku wê were hanîn li ser ziman wê tenê sedema wê 'aramîya

herêmê´ bê? Di aslê xwe de wê, ji wê zêdetirî wê, zihniyetek ku me li jor bi minaqên wê hanî li ser ziman wê di temenê wê de **wê hebê**.

Kurd wê, di vê rewşê de wê, bihizirin ku ´wê, sînorê mirovatîyê wê heta sînorê kurdan bê.´ Bêgûman wê, ev têgih wê vala di mejîyê kurdan de wê ne afirê û wê newê bi lêvkin. Gelek sedemên wê hena. Lê sedema pêşî wê ew bê ku ev bi dehan salana li berçavê hemû cihanê pêvajoyên şer li ser serê civake kurd dihên meşandin li berçavên hemû cihanê û wê komkujîyên ku wê di wan de wê bi deh hezaran û sed hezaran kurd wê di wan de wê werina qatilkirin wê bên hanîn li serê kurdan. Lê wê li hemberî wan wê, dûnya wê hemû komkujî û şerên li dijî civake kurd wê ji nedîtî ve wê were. Yan jî wê, hinek kesên ku wê, werênina li ser ziman wê, bi nakokî û ankû pêşbazîya di nava hêzên hegomînikî ên weke rûsya û amarika û hwd de wê, werênina li ser ziman. Bi van rengan hanîna li ser ziman wê, weke şewayekê sernûxûmandinê jî bê. Pêvajoya hêrîşên li dijî afrînê de wê, di vê çerçoveyê de wê hinek şîrove wê, li ser amarika û rûsya re wê, werina kirin. Wê bê gotin ku ´ew du hêzên ku ew li pişt perdeyê bi hevdu re di qada sûrî de bi armanca xwe serdestkirinê wê şer bikin. Hêzên ku ew li qadê şer dikin jî wê, weke encama wê were dîtin. Di aslê xwe de wê weke ku me li gelek deveran di herîkîna nivîsandina xwe de hanî li ser ziman wê ne şaş bê. Lê ev rastî ku ew bi wê rengê ku ew dihênê li ser ziman wê, weke sernûxûmandinekê ji wê şerê bi armanca jenosîdkirina civake kurd de jî wê, were hanîn li ser ziman. Ber vê yekê mirov nikarê wê tenê bi wê rengê wê, werênê li ser ziman. Ji zêdetirî wê, em di serî de ji aliyê têgihîştina mirovî û mirovatîyî ve em, divê ku nêzîkî mijarê bibin. Ji aliyê hebûna jîyane civake kurd ve em, nêzîkî mijarê bibin. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku em ji van aliyan ve dinerin jî em, dibînin ku wê, dibînin ku wê, dibînin ku wê, hêrîşên ku wê bi armanca tûnakirina hebûna civakî wê, di bin rengên hêrîşî ên ku ew bi wê rengê dihên salixkirin û hanîn li ser ziman de wê were pêşxistin û wê bi awayekê din wê, were dayîn nîşandin. Hêrîşên ku wê, bi hêncetên ´parastina sînor´ û ankû ´çêkirina ewlakarîya sînoran´ û hwd ku wê werina kirin wê, weke hêrîşna ku wê çawa wê hebûna civakê wê ji navika wê ve ve wê were armanc girtin wê, di wê çerçoveyê de wê, ew hêrîş wê werina pêşxistin. Hêrîşên li dijî afrînê û ankû giştîya rojava jî wê, di vê çerçoveyê de bin. Di pêvajoya destpêka rojava de wê, dema ku rejîma tirk ji rojava û amarika ya ku wê dixwest nedît wê xwe nêzî rûsya bikê û wê, hêrîşên xwe li kurdan wê weke li afrînê û hwd wê pêşbixê. Piştî hevdîtina rayadarên tirk û yên amarîkî di serdana Rex tillerson de wê, rewşek din wê biafirê. Wê gotinên weke ´artişa tirk û ya sûrî, care pêşî derfeta hatina wan ya berhevdû bûya ku ew bi hevdu re şerbikin.´ Ji van gotina mirov fahmdîkê ku wê, di civîna tillerson a birayadarên tirk re wê, ew wê were ser ziman ku ew rejîma tirk li afrînê û herêmên din ên sûrî jî bi rejîma sûrî re bide şerkirin. Li ser wê re dibê ku di hevdîtina tillerson a bi rayadarên tirk re ev hatibê li rojevê û bi wê re rayadarên tirk doza ketina giştîya rojavajî amarika kiribin û destûra wê xwestibin. Di destpêka hevdîtinê de wê, weke ku wê Reuters jî wê, ragihênê ku wê, rayadarên tirk wê bixwezî ku ew bi amarîkarîyîyan re li mimbçê bin. Ji wan xwestibûn ku meclîsê mimbçê were ji hevdû belavkirin. YPG ji wir were dayîn vekîşandin û hêzên tirk bi yên amarîkî re wir kontrolbikin. Di vê çerçoveyê de wê, bêgûman ku rayadarên tirk derfeteke bi vî rengî amarika bide wan wê, bi rejîmê re jî wê, şer bikê. Lê wê di berdêla wê de ku ew bi tememî hêrîşî rojava bikê û ew bi tememî rojava di pêvajoyek komkujîyê de derbas bikê ku ew destûra wê bistênê. Bêgûman wê ev jî wê di hevdîtina tillerson a bi rayadarên tirk re de

wê were li rojevê. Tenê ku mirov li gotinên rayadarên tirk ên piştî hevdiîtinê binerê mirov wê fahmbikê ku wan destûra wê xwestina.

Di dewama wê de mirov dikarê wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, çendî ku wê, di civîna NATO de wê weke **‘pêşniyara Mattîs’** wê werênina li ser ziman ku wî gotîya ku ”em dikarin YPGê bi PKKê re bidina şerkin” jî wê, di aslê xwe de wê, ev wê xwestekê rayadarên tirk bê. Wê di destpêka şerê xwe yê bi kurdan re wê, hertimî wê li başûrê kurdistanê jî û bakûrê kurdistanê jî û rojava wê bixwezê ku ew wê pêşbixê. Hemû nakokiyên di nava sîyeseta kurdan de ku ew hatina afirandin li başûrê kurdistanê, li rojava û bakûrê kurdistanê wê nakokiyên bo vê temenê bin. Di serî de mirov divê ku wê temenê wê kifşbikê.

Di vê rengê û awayê de wê, di aslê xwe de bo ku rejîma tirk destûrê ji domandina qirkirina kurdan a ku ew dikê û didomênê de bistênê wê, dema ku amarîka derfetê li rojava weke bi ketina li mimbiçê û ankû herêmên bidîyê de wê rûsya jî wê bi firoşê. Di vê çerçoveyê de wê, mirov dikarê binxatbikê û wê werênê li ser ziman.

Pêvajoyên hêrişên li hebûna civake kurd ku ew dihên kirin û pêşxistin wê weke pêvajoyên hêrişê ên ku mirov wan dikarê bi teybetî hilde li dest û werênê li ser ziman. Di dewama wê de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di roja 20ê sibata 2018an ku wê weke ku wê rûsya jî wê bixwezê ku ew hinek hêzên rejîma sûrî li afirînê bicihbikê wê, piştê wê, were dîtin ku ew dikarê were wergerandin li şerekê di nava rejîma sûrî û ya tirk de jî. Di vê çerçoveyê de wê bêgûman piştî hatina çend milîsên rejîmê li afirînê zirtên rayadarên tirk wê, di vê rengê û awayê de wê weke zirt û ankû tehdîdên ku ew bi wê rengê temenê wê çêbikin bê. Bêgûman ew li ser wan tehdîd û ankû zirtan re wê, têkiliyê bi amarîka re jî wê dênin. Heta ku wê, pêşniyara li rejîma sûrî xistinê jî wê di berdêla li rojava û kurdan xistinê de. Bêgûman temenê wê bi rejîma tirk re nîn a. Lê ew li wê nahizirê. Ew li wê dihizirê ku ew di destpêkê de wê, destûrê bigirê û ku ew ji rojava dest bi hêrişê bikê û di dewama wê de bêjê ku ezê bi ber şamê ve herim û li hemberî berxwedana kurdan bêjê ku ew aligirên rejîmê na û bi wê rengê rewşa wan werênê li ser ziman û alîkarîyê ji hêrişên xwe re bistênê. Ew ku heta bi şamê neçê jî ew di demek kin de bi hêrişên xwe yê li dijî rojava ku ew temenê wê bi rûxênê. Ya ku ew nûha li wê dihizirê wê ew bê. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa kurd û ‘pirsgirêka kurd’ ku wan afirandina wê, temenê kêlik bi kêlik mudahaleyên li sûrî û ankû li giştîya rojhilat bê. Di vê çerçoveyê de wê, di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Rewşa pirsgirêka ku wê, weke ku wê, di destpêka mudahaleyê li sûrî û heta rojava me wê, temenê mudahaleyên li wê biafirênê wê, bi heman rengê li rejîma tirk û ya îranê jî wê, biafirênê. Di vê çerçoveyê de gûharandina demografîya sîyesî wê, rêya wê bi vê rengê wê di kurdistanê ve wê derbas bibê. Di serî de wê, divê ku mirov wê, werênê li ser ziman. Ya ku î ro, îran jî wê pirr zêde di tirsihê wê, çawa wê li ser pirsgirêka kurd weke ku li îraqê û sûrî mudahale bûn ku wê li wê jî bibê. Rûsya jî wê dibînê. Ber vê yekê ew, bahse ‘telûkeya leyistina amarîka a li ser rewşa kurd re’ dikê. Di vê rengê û awayê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa kurd wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka teybet bê.

Weke ku me li jor hanî li ser ziman em li wê bi hasibênin ku wê, amarîka destûrê bide tirkîya ku ew bikeve mimbiçê û ankû herêmên din ên rojava. Ew nikaribê bikeve wan de jî wê, çawa wê hêrişê wan bikê wê, destûrê wê bidîyê de. Ev wê, ji aliyekê din ve wê, nikaribê rewşa kurdan a li rojava xirabikê. Çawa ku bi hêrişên DAÎŞê nikarin wê bikin.

Lê wê, ev rewşa sûrî û ya temenê mudahaleyên li sûrî wê, biherikênê li aliyê pirsgirêka kurd a li bakûrê kurdistanê jî. Di vê çerçoveyê de wê, ew destûra ku wê, ji tirkiya bi awayekê mihtemel wê bê dayin wê, bi wê temenê mudahaleya li bakûrê kurdistanê wê, were çêkirin bê. Di vê çerçoveyê de wê, însîyatîfa li ser pirsgirêka kurd wê zêdetirî wê, bikeve destê wan de. Wê "qada pirsgirêka kurd a weke cihê mudahaleyê" wê, bi ya rojava a di nava sînorê sûrî de wê berfirehtir bibê. Wê bi wê re wê, dema ku ew li bakûrê kurdistanê hat pêşxistin wê, hingî wê sînorê wê mudahaleyê wê were û bigihijê li îranê wê, hingî wê temenê mudahaleyê wê bi awayekê pîrr xort wê li îranê wê li ser rojhilatê kurdistanê re wê, zêdetirî wê, were pêşxistin.

Di aslê xwe de wê, dema ku mirov li pêvajoyê dinerê mirov, dibînê ku wê, bi awayekê wê, bi rengekê bi wê rengê wê xwe bide dîyarkirin. Ev ku bi şewa û rêbazên leşkerî bê û ankû dîplomatîkî û sîyesî bê wê demê rê bi mudahaleyan bi ber wir ve diçêt. Di serî de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Hinekî jî rayadarên tirk ku wan pêvajoya çareserîyê derfeta wê ji dest berda û pirsgirêka kurd çareser nekiirin bi xwe re û li bakûrê kurdistanê wan, hingî derî li rewş û mudahaleyên bi vî rengî vekirin. Di vê çerçoveyê de wê, herêm wê bê xistin pêvajoyek şer a ku wê bi dehan salan wê bidomê. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de pêvajo bi ber wê ve diçê. Di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Bi mudahaleya li îraqê a pêşî di salên 1990î û pê de wê, piştê wê heta roja me wê, di vê çerçoveyê de wê, reng û awayên mudahaleyê wê were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, di dewama ya li îraqê de wê ya sûrî wê were pêşxistin. Di vê rengê û awayê de wê, di dewama wê de wê, ev pêvajoya bi sûrî re jî wê, ne kêmi pêvajoya şerê navxweyî ê îraqê ê ku ew heta roja me didomê wê bidomê. Rewşa mayîna di roja me de a esad û rejîma wî, wê bi şibihê ya saddam û rejîma wî. Di vê rengê û awayê de ew dihê dîtîn.

Ji aliyekê din ve jî wê, divê ku mirov wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa mudahaleya li sûrî wê, derî li ya tirkiya û îranê jî wê vekê. Di vê çerçoveyê de wê, weke ku gelek caran berê hanî li ser ziman wê ew qûdret û sîyane van rejîman wê, nebê ku ew bi serê xwe pirsgirêka kurd di nava xwe de di çerçovaya radestkirina maf û azadiya civake kurd de çareser bikin. Wê ev jî wê, were dîtîn ji aliyên hêzên hegomînik ve. Wê ev jî wê, temenê mudahaleyên wan baştirin wî bi afirênê. Li herêmê pêşbazîya bi hêza leşkerî ya ti rejimên herêmê tûna ya. Hemû duvikên amarika û rûsya de bin. Di vê çerçoveyê de wê, bi destê wan wê çawa wê ew pêvajoya mudahaleya li wan wê, gav bi gav wê were pêşxistin em di vê demê de wê şahidiya wê dikin. Ku em mudahale bi leşkerî jî bin û ankû bi dîplomatîkî û sîyesî jî bin rastî ev a. Wê, ji wê derbas nebê. Li herêmê jî şerê hegomînikî ê serdestîyê zêdetirî wê, weke ku wê, birêz ocalan wê werênê li ser ziman wê **şerê pergale giştî a cihanê ê sêyem** dihê jîyankirin. Ev şerê cihanê ê sêyem in a ku ew li kurdistanê û herêmê didomê ya. Di vê çerçoveyê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman.

Dibê ku xosletên şerê cihanê ê sêyem, ne weke yê şerê cihanê ê yekem û duyem bê. Di vê demê de li gorî demê bi şewayekê din xwe dide nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de wê, ev şerê cihanê ê sêyem ku ew dihê meşandin wê armanca wê giştîya asya, cihane arab û kurdistan û bi wê re giştîya rojhilat bê. Di vê çerçoveyê de wê, ev şerê cihanê ê sêyem wê ne weke şerê cihanê ê yekem û duyem wê, bi artişan wê were berhevdu û di demen kin de wê bikin encamê bidest bixin. Wê ji wê zêdetirî wê, şerekê cihanî ê hegomonîkî yê li demê belav kirî wê were meşandin. Xosletên şerê cihanê ê sêyem wê, bi awayekê li demê belavkirî ku wê, bi teknîk, çapamenî, ragihandin û cih bi cih û ankû

dem bi dem wê, bi rengê mudahaleyên fizikî ên bi leşker û şer bê. Ya ku em, ji xwe wê nûha dibînin û şahidiyê ji wê dikin jî wê ev bê. Di vê demê de ev dihên jînkirin. Di vê demê de wê li gorî wan xosletan û xosletên weke wan wê şer wê were kirin. Di vê çerçoveyê de wê, bi çekên sofistîke ên teknîkî û hwd re wê, ew were bi rêvebirin. Ku mirov bahse çekên sofistîke bikê wê, ji gelek aliyan ve bi derfet bê ku mirov bahse wê bikê. Wê ji aliyê teknolojîkî û bîolojîkî ve wê di serî de wê derfet ku em bahsê bikin. Di dema şerê cihanê ê duyem de wê, destpêka bikarhanîna çekên kimyewî wê weke bibê. Di wê demê de wê, bi rewşên weke bikarhanîna bombayên atomê li naqazakî, hîroşîma û hwd wê, xwe bide domandin. Piştî wê, heta ku wê dem wê were dema bikarhanîna çekên kimyewî li kurdistanê li deverên wê yên weke helebçê û hwd wê bidomê. Xosletê bikarhanîna wê jî wê, piştî wê, ne bi rengê avêtina li hevdû a bombayên atomê bê. Lê wê di dest de wê ew wê çêbikin û di dest de wê bigirin û wê bi wê hem hevdû tehdîd bikin û hem jî wê bi wê bikin ku serwerîya xwe li hevdû çê bikin. Lê wê kevneşopîya nazîyan weke di mezela bi tişî mirov kirin û gaz li wan kirin û bi wê re kuştin û ankû qatilkirin wê, piştî wê, bi awayekê veşarî wê hema bêja wê pîrranîya rejimên serdema wê bikin. Rejîma tirk minaq wê, dema ku wê bahse bikarhanîna çekên kimyewî weke bi gazê û hwd li cem wê were kirin wê bi tundî wê înkâr bikê. Lê wê, di dîroka xwe de wê, bi dehan caran wê weke ku wê nazî gazê bikarbênin wê, li dijî kurdan wê bikarbênin. Minaq piştî komkujiya dersimê(*) hinek rayadarên tirk ku wê bîrhanînên xwe werênina li ser ziman û ankû w binivîsênin wê, di wan de wê di vê warê de wê hinek gotinan ervî îredeya wan jî bê wê bikarbênin. Minaq wê, wê bêjin "me şikeftî tişî mirov dikirin, deve wê digirt û gaz di berda hundûrê û weke 'haşaratan' hemû dikuştin(*)". Ev gotinên bi vî rengê wê piştî komkujiya dersimê wê bo dema kirina komkujiyan a li dersimê de wê were li ser ziman. Wekî din jî wê, piştî ku wê tekoşîna maf û azadîya kurdan li bakûrê kurdistanê wê destpêbikê wê, rayadarên tirk wê çekên ku ew bikardihênin wê, di şewayekê ku ew karibin wê kontrol bikin û bandûrên wê, di demek kin de ji holê bidina windakirin û ankû nehêlin ku ti kesek wê kifşbikê wê, gazên kimyewî weke çekên kimyewî wê li dijî kurdan bikarbênin. Saddam bi carekê wê, pêşî wê li deverên piçûk wê, cih bi cih wê, bikarbêne. Piştî dema ku wî dît ku wê, bi wê di cih de wê hemû kurdan tûna bikê wê, bidest barandina gazê bi helikoptêran li herêmên kurdistanê ên weke helebçê û hwd wê bikê. Rejîma tirk wê ber ku ew endamê NATO bê wê, ev bikarhanîna wê ya çekên kimyewî wê ti carî wê bi wê sedemê wê newê li rojevê. Ji aliyekê din ve jî wê, dema ku wê rêxistinên kurdan ên ku ew tekoşîna maf û azadîyê civake kurd didin ku ew hatina xistin li listeyên 'terorê' de wê, êdî wê dema ku ew li dijî wan kurdan dihat bikarhanîn wê ew weke 'tekoşîna li dijî terorê' wê were pênasekirin û wê ti kesek wê li ser wê sekinê. Ji aliyekê ve wê ev gotina tekoşîna li dijî terorê wê, ji van aliyan ve wê, ji gelek sûcên li dijî mirovatîyê ku wê li kurdistanê wê werina kirin re wê kirin weke maske û ankû qamûflaj.

Dema ku dîroka rejîma tirk were lêkolîn kirin wê ew wê biawayekê vekirî wê were dîtin. Di dewama wê de mirov dikarê wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, tekoşîna

 (*)Komkujiya rejîma tirk heta sale 1937an li bajarê kurdistanê ê dersimê kir

(*)Ev wê weke gotineka rayadarên tirk ên ku wan li wir komkuji pêkdihani bû. Wan pêşî girseyên bi sedan û hezaran kurdistanî dikirina şikeftan û devê şikeftan digirtin û gaz fiberdan hundûrê şikeftan. Piştî kirina wê rewşê re wê, ew wê gotinê wê bikarbênin û wê bêjin ku 'me ew weke haşararatan dikuşt'. Gotina 'haşaratan' jî wê gotineka ji zimanê kurdî bê. Lê bûhûrandina zimanê tirkî û ew rewş bi wê dihanîna li ser ziman. Bo ku wê di mejiyê kurdan de bidina bicihkirin û kurdan bi wê bidina tirsandin.

civakê wê, çawa wê, were tafisandin wê, bo wê her rêyê wê ji xwe re wê mubah bibînin. Rejimên roja me wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediye mejûyeka dîrokê a bi vê rengê bin.

Ji aliyekê din ve jî wê, dema ku wê, li rengên bikarhanîna gazên kimyewî li dijî jîyane mirovan wê were nerîn wê, were dîtin ku wê gelek rêyên wê werina dîtin û kifşkirin. Wê, bi wê re wê, ew rê wê werina bikarhanîn û wê ew gazên kimyewî wê li dijî civakan û jîyane wan wê werina bikarhanîn. Lê dema ku ew mijar hat li rojevê jî wê, bi tûndî wê înkâr bikin. Înkâr wê, ji aliyekê ve wê weke rê û rêbazekê sernûxûmandinê bê. Di vê çerçoveyê de wê, înkâr wê, weke rê û rêbazakê ku ew çendî gazên kimyewî kardihênin ew, bidîna nîşandin ku wan ew nekiriya wê, bikarbênin.

Minaq wê, bi teknolojikî wê, balafirên şer ên bi teknolojiya pêşketî, bombayên bandûr mazin, teknikên lîxistin û şopandinê û hwd wê, werina pêşxistin. Ji aliye bîolojikî ve wê çekên kimyewî wê, weke ku wê li helebçê û gelek deverên din ên bakûrê kurdistanê ên weke 'geliyê tiyara' û hwd ku wê, rejima tirk weke ya rejima saddam wê bikarbênê wê bibê. Di her hêrîşê de wê, aliyekê wê yê helebçeyî wê hebê. Yanî di her hêrîşên ku wê li dijî kurdan wê rejimên herêmê wê bikin wê aliyekê wê yê helebçeyî jî wê pêşbixin. Di şerê her çar rejimên herêmê ên li dijî civake kurd de ên rejimên weke rejima îranê, rejima tirk, rejima baxdadê û rejima sûrî wê, cih bi cih wê, bikarbênin. Di vê rengê û awayê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Lê yên ku ew herî zêde navê wan zêdetirî derketiya li pêş wê rejima saddam û ya tirk bê. Ev herdû rejim wê, ber ku wê, biawayekê aktiv wê di demên xwe de wê di nava şerê fatisandin û tafisandina civake kurd de bin wê, bo wê, bikarhanîna gazên kimyewî wê, weke rêyeka xwe serwerkirin û bi wê şikandina vîna civakê wê bibînin û wê, bikarbênin. Di pêvajoya hêrîşên li dijî afrînê de jî wê, gaza kimyewî ku em dikarin weke çeka kimyewî binavbikin wê, weke 'gaza klore(*)' wê were bikarhanîn ji aliye artîşa tirk ve li dijî afrînîyan. Li herêmên afrînê ên weke gûndê erendê ku ew girêdayî sîyê ya wê li wê û deverên li dora wê, gaza klore wê were bikarhanîn.

Meclîsa Tenduristiyê ya Kantona Efrînê da zanîn ku artêşa Tirk a dagirker li gundê Erindê yê navçeya Şiyê yek ji çekên kîmyewî yên qedexekirî ankû gaza klore bi karhaniye û bang li saziyên navneteweyî dikê dakû lêpirsîneke navneteweyî bidin destpêkirin. **Ev rewşa bikarhanîna gaza klore wê di roja 16 sibate 2018n de wê li gundê erindê û herêmên li dora wê ên sîyê dibê.** Meclîsa tendûrustiyê a afrînê wê, bi vê bangê wê ragihandina xwe ya di derbarê bikarhanîna gaza kimyewî a klore de wê bidomênê û wê bêjê ku *"artêşa Tirk, piştî ku çekên kîmyewî li dijî welatîyan bi kar anîn, pêvajoya hêrîşên wê yên li dijî afrînê derbasî qonaxeke nû ya binpêkirina nirx û pîvanên navneteweyî bûye û wiha pê de çû, 'em bang li hemû saziyên navneteweyî yên peywendîdar û hemû rêxistinên mafên mirovan dikin ku lêpirsîneke navneteweyî û serbixwe derbarê bikaranîna tirkîyeyê ya çekên kîmyewî ên ku wê bikar anîna de bidin destpêkirin. Em amade ne li ser vê mijarê bi van aliyan re hevkarîyê bikin dakû karibin nimûneyan ji diyardeyên bikaranîna çekên kîmyewî wergirin û lêpirsînên xwe bidin destpêkirin."* Meclîsa tendûrustiyê a afrînê wê bi komek bijîşk wê di bin serokatîya bijîşk û ankû doktor Xelîl Sabrî de wê lêkolînan li herêma ku artîşa tirk li wê gaza klore bikarhanîya wê lêkolînan bikin û wê, dê piştî wê bi civîna çapameniyê wê ragihênin ji rayagiştî a netewî û navnetewî re. Wekî din jî wê, li gelek deverên din ên afrînê wê

(*)Gaza klorê wê weke gazak kimyewî a weke çekê kimyewî jî mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Bo girseyan bi komî bikujê û herêmê ji wan paqij bikê tê bikarhanîn

nûçeyên bi wê rengê wê werin ku wê, gûleyên zahrkirî wê werina bikarhanîn. Yanî her devera ku ew gûla dihatina avêtin li wê, li wir wê, bandûra wê li devera ku wê lêkeve wê zêdetirî wê xwe bide nişandin. Di derbarê bandûra wê de wê, ji ragihandinên ji bijîşkan zêdetirî wê yên ji nava xalkê di nûçeyan de wê, werina li ser ziman û wê di wan de wê were li ser ziman ku wê, ew "devera ku ew gûle lê diketin wê hemû zindiyên li wir dimirin."

Li bakûrê kurdistanê jî wê, gelek caran wê were li ser ziman ku wê, dema ku wê, li deverna di nava artişa tirk û gerilleyên kurd de wê şer biqawimê wê, were dîtin ku hinek ji wan gerilleyan wê laşê wan bê ku ti gûle lêketibin wê bi tememî şawitîbê. Hinek ji wan jî wê weke xwe bêî ku ti gûle lêketina wê, jîyane xwe ji dest dabûbûbin. Wê, di vê rengê û awayê de wê, ji wan wê bahs wê were kirin.

Di şerên roja me de wê, di vê çerçoveyê de wê, ev çekên kimyewî jî wê werina bikarhanîn. Wê rejimên herêmê wê bi wan wê, komkujîyan wê werênina li serê civake kurd. Rejimên herêmê wê, hertimî wê di nava hewldana xwe gihandina wan çekên kimyewî û yên giran de bin. Wê, di vê çerçoveyê de wê, hêza lêxistina wan çekan wê çawa wê giran bê wê li wê bihizirîyan. Di vê rengê û awayê de wê, ew çekên ku wan dikir ku ew xwe bigihênina li wan wê çekna ku wê, hêza wan ya lêxistinê ku ew pirr zêde mazin û giran bûba. Di vê rengê û rewşê de wê, ew çek wê, bihetana dîtin.

Gotinên weke 'xwe gihandina çekên giran û bi wan şerkirin û serketin wê, were li ser ziman. Rastiya wê gotinê jî **wê**, têgihîştin û teknîkên ku ew dihên bikarhanîn wê bi wê were li ser ziman. Encamên wê jî wê di wê çerçoveyê de wê, ne di demek kin de wê, di demek dirêj de wê li gorî wê li demê belavkirina şer wê, xwe bide dîyarkirin. Di vê rengê û awayê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku ev şerê wê, weke şerekê herêmî bê. Di vê rengê û awayê de wê, mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Lê kî çi bêjê bila bibêjê em, divê ku wê bêjin ku wê, piştî wê, şerê wê ti demografîyên sîyesî wê, weke xwe û weke nûha wê nemênin. Çendî ku wê, bi pergale cihanê jî wê parastina wê were kirin jî.

Ev rewş wê, weke rewşeka ku em hinekî din di dewama wê de li ser wê bisekin in û wê werênina li ser ziman. Em berdewam bikin û wê hinekî din wê **werênina li ser ziman**. Şerên ku ew di roja me de dibînin wê, bi wan wê çawa wê mudahale wê li jîyane civakan, herêman û hwd wê were kirin û wê bi wan wê xwe bê kirin serwer li wan civak û ankû herêman wê bi wê rengê wê were bikarbênin. Minaq di rewşa afrînê de wê, rewşeka bi vê rengê jî wê, were dîtin. Ew jî wê, ew bê ku wê rayadarên rûs wê, pêşî wê ji kurdên rojava wê bixwezî ku ew destûrê bidina hêzên rejimê ku ew derbasî afrînê bibin. Kurdan ev herê nedikir. Wê piştê wê, çawa wê bi şer wê, kurd wê werina li rê wê, rûsya wê bikeve pay dîtina rêyên wê de. Wê, piştê wê, rejima tirk wê, rayadarên dizanin ku ew hertimî li dijî her destkevtiyên civake kurd in. Wê bo vê yekê wê, destûrê bidina artişa tirk ku ew hêrişan bixwe û bi komên ku ew di nava xwe de bi rêxistin dikê bibê li ser afrînê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, çawa wê, weke ku wê, bi wê şerê wê mudahale hem li jîyane civake kurd wê were kirin û hem jî wê, li herêmê wê were kirin wê, di wê de wê rêbaze şer wê bi wê rengê wê ji aliyê rûsya ve wê were bikarbênin. Di vê rengê û awayê de wê ev pêvajoya şerê li dijî afrînê wê were destpêkirin.

Di pêvajoya hêrişên li dijî afrînê de wê, bi wê rengê wê sê armancên rûsya wê hebin. Wê yek wê, ew bê ku wê çawa wê li gorî xwe wê kurdan wê bi şer û hêrişan wê 'terbîye bikin' wê bi wê kontrola xwe wê, li ser wan çêbikin bin. Ji xwe wê, di 20ê sibate 2018an

de wê rayadarên rûs ên weke Sergey Lavrov wê, ragihênin ku ”kurdan, xwesiya xwe li herême denezend wê, xismetî çareseriyê nekê.” Yanî li gorî wî, kurdan diviyabû ku wan xwesiya ne denezendiba. Li gorî xwestekên rejimê û weke ku wê heta roja me dixwest di rewşek bêstatû de xwe hiştiba û bi wê re xwe ji tûnakirina wê re bi rêyên şer bê û ankû asîmlekirinê bê vekirî hiştiba. Ya ku rûsya tefkîr dikê bi gotinên lavrov re dihênê li ser ziman wê ev bê. Wekî din jî wê, rewşa tîkiliya amarika a bi kurdan re wê, di vê çerçoveyê de wê, weke tîkiliyeka ku ew bi wê piştgiriyê didina xwesiya kurdan û ew li gorî wan nerast a û xismetî çareseriyê nakê. Di vê çerçoveyê de li gorî wan statûya kurdan li gorî wan ne rast a. Yanî bi gotineka din wê, weke ku wê ji gotinên lavrov jî wê were fahmkirin wê, politikaya rûsya wê, di çerçoveya zihniyeta wê de wê, jenosîdkirina li ser serê civake kurd ku wê, heta roja me wê rejima tirk, rejima îranê, rejima îraqê û rejima sûrî bi gelek pêvajoyên komkujiyan dana domandin ew, diviyabû li gorî rûsan di vê demê de wusa hatiba domandin. Mantîq û zihniyet ev a. Di vê rengê û awayê de wê, mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, çendî wê gotinên weke ”demorasîyê”, ”rêzgirtina ji mafê mirov re”, ”bila gelê sûrî bi hilbijartinan ew li ser îredeya xwe biryarê bide” û hwd wê, bikarbênin jî lê wê, ev gotin wê, weke gotinna maske ji vê rengê zihniyetî ên ku wê bi gotinên lavrov re wê werê li ser ziman bê. Dema ku tu bêjê ”bila xalkên li wir ew biryarê li ser îrede û pêşaroja xwe bidin” û piştê di rabê bêjê ”kurdan, xwesiya denezend wê, xismetî çareseriyê nekê” û tû rabê amarika jî li ser wê piştgirîna wê re wê rexnebikê wê, demê ew gotinên te weke derew û maske na. Ji wê nabûhûr in. Di serî de wê, mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Wê, demê bi rengê kirina sîyesetê a dirû ji aliyekê wê dibêjê û ji aliyê din ve wê vala derdixê wê demê tû çawa dikarê bahse ’mafê mirovan’, ’demokrasîyê’, ’nirxên mirovatîyê’ û ’navê xalkan’ bikê? Wê demê wê ev hemû bahskirin wê weke derewekê wê li holê bimênin ku ew ji aliyê te ve ew hatina kirin. Di serî de wê mirov dikarê wê binxat bikê û wê werênê li ser ziman.

Nûha wusa dihê dîtin ku wê rûsya wê, hebûna statûya kurd û xwesiya wê û ankû rewşa wê ya cûda ku ew bi çî rengê wê were li ser ziman wê li ser tîkiliyên xwe yên bi amarika re û ankû dijberiyên wê yên sîyesî û hwd re wê bikê armanc. Wê bi wan wê bikê ku ew gotinên rexne li amarika bigirê. Di vê çerçoveyê de wê, gotinên weke gotinên xafk wê ew bê ku wê, b gotin ku ”parastina yekparatîya sûrîyê” bê. Di aslê xwe de wê, ev gotin wê, weke ku wê li îranê, îraqê û tirkîya ku bûya wê li sûrî jî wê temenê qirkirin û komkujiyên dîrokî û mazin ku ev rejim bikê bê. Li ser wê gotinê re wê, rejima rûsya jî wê, wê ne tenê hêrîşên li dijî kurdan wê hem li dijî wan bédeng bibînê û wê ’meşrû’ wê bibînê wê weke din wê temenê rast dîtin û ankû teşwîkkirina hêrîşên nû di demên nû de li hebûna civake kurd jî bê. Di vê rengê û awayê de wê, di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, di vê rengê û awayê de wê, sîyeseta rûsya wê, weke sîyeseteka ku ew xwe li argûmanên statûqûya herême digirê û li ser wê re wê tîkçûyî bê. Di serî de divê ku mirov wê, werênê li ser ziman ku wê, bi vê rengê wê gotinên weke yên ’demokrasî’, ’rêzgirtina ji mafê mirov re’ û ankû gotinên weke ’bila xalkên sûrî ew bixwe biryara xwe bixwe bidin’ wê weke gotina ku wê bi wê rengê sîyesetê wê temenê wan nebê bê. Wê weke avahîyeka ku ew temenê wê li ser rûyê ardê tûnayî wê bimênê. Di vê rengê û awayê de wê, bi vê rengê sîyesetê wê, tenê wê li herême wê şer, komkuji, tengazerî û pêvajoyên hêrîşan wê karibin birêxistin bikin û pêşbixin. Wekî din wê vajî wê, nikaribin pêşketineka weke bi gotinên weke yên ’demokrasîyê’, ’mafê mirov’, naskirina hebûna xalkan û hwd re pêşbixin. Di vê çerçoveyê de wê, hin rayadarên rûsî ku ew gotinên bi vî rengî

bikardihênin wê bi rengê sîyeseta ku ew dikin û temenê wê û têkiliyên wan ên sîyesî re wê, ne tenê wan gotinan wê vala derxin wê wekî din wê, vajî wan wê di rastarastçûyîneke de jî bin. Di serî de wê, divê ku mirov wê, werênê li ser ziman.

Di bin navê gotinên weke yên 'çareserîyê', 'aramiyê' 'aşîfîyê' û hwd de parastina wê pergale şer, pêşxistina wê û domandina wê, di aslê xwe de wê, li herêm wê, weke temenê yekanê ku wê li pêşîya pêşketina wê bi gotinên weke bi demokrasîyê, mafê mirov, pêşketina xalkan wê asteng bê. Di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê, rewşa rûsya wê, di vê demê de wê, bikeve rewşa osmanî a sedsale 16' min de. Wê, di wê demê de jî wê herêm wê li ber kirina ronasansekê di xwe de bê. Lê wê, bi pêşketina osmanî re wê, ew temenê ronasanse herêmê wê bi tememî wê were tûnakirin. Wê were ji holêrakin. Wê li şûna wê, ev rewşa statûqûyî wê bi îranê re ku wê bidomê wê were heta roja me. Di vê demê de jî di aslê xwe de rojhilat wê weke ku em dibînin wê li ber ronasanse civakên xwe bê. Di vê demê de wê, li rex rejimên herêmê ên weke rejima tirk, ya îranê û hwd wê, rûsya wê weke astengîyeka dîrokî wê, weke ku em di rewşa sûrî de dibînin wê asteng bê li pêşîya wê. Di serî de wê mirov dikarê weke aliyekê wê yê din ê giring wê werênê li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de wê, mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê di dema yekîfîya sovyet de wê, tevgerên civaknasî û civakî wê werina piştgirkiim.. Wê, ew wê, li herêmê çendî ku wê nikaribin xwe derxina li astek bilind a desthilatdarî jî lê wê bandûra wan li pêşketina civakan wê zêde hebê. Wê di bin navê gotina 'bayê çapê' de wê, ew rewş wê xwe li kurdistanê, tirkîya, îranê, û herêmên araban wê bide diyarkirin. Lê piştî wê, dema ku wê, yekîfîya sovyet wê têkherê wê li şûna wê rûsya wê pêşkeve. Ew jî wê bo ku ew xwe weke hêzekê biparêzê wê bi statûqû û paşverûfîya herêmê re wê bikeve nava levkîrin û paymanê de. Wê li ser wê re wê, li dijî xalkên herêmê wê di rewş û pozisyoneka dijber de wê, cih bigirê.

Di vê rengê û awayê de wê, ew ew bayê weke yê di dema 'şerê sar' de ku wê di nava amarika û yekîfîya sovyet de wê bibê wê, di aslê xwe de wê, rûsya wê, pîr li şûn wê jî bikeve. Yekîfîya sovyet a wê demê ku wê piştgirî heta demekê û astek û deverêkê bide tevgerên gelan ên bo maf û azadiyê wê, wergerihê li rûsya ku ew weke ku em li herêmê dibînin ku ew li dijî tevgerên gelan disekinê û di rewşa tafisandina wan de û bi wê re di şikandina vîna gelan de wê, bê xwediyê rengêkê sîyesetê û wê bi statûqûya herêmê a dijgel û ankû dijçivak re wê tevbigirihê. Bêgûman rewşa rûsya piştî yekîfîya sovyet wê divê ku mirov wê şrovebikê û wê werênê li ser ziman. Ev rûsya ku ew bi vê rengê bi rengêkê sîyesî ku ew bi statûqû re tevdigerihê û bi statûqûya herêmê re wê, li herêmê wê, rûsya wê bikê rewşek çawa û wê çawa bênê li berçav? Di serî de wê, rûsya wê di reng û awayê rejima îran û ya rejima tirk de wê bike rengêkê û awayê de. Ev jî wê, bi tememî wê ji aliyê xalkên herêmê ve wê, were redkirin. Di serî de wê, berî ku birêz Ocalan were dilgirtin û radestkirin li tirkîya û piştî jî wê, ji ber wê temenê wê yê li wer mîreteya yekîfîya sovyet ku wê, hebûna gelan û xalkan wê dervî statûqûya herêmê wê bibînin û wê herê û qabûl bikê wê, gelek caran wê bangê li rûsya jî bikê ku ew di çareserkirina pîrsgirêka kurd jî weyn bileyîzê. Di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê, di çerçoveyek demokratîkî, rêz girtina ji hebûna xalkan û civakan û parastina hebûna wan û li dijî pêvajoyên jenosîdê ên rejimên herêmê li ser serê civakên weke civake kurd ku ew bisekinê wê li wê gelek caran wê bang wê werê kirin. Lê rûsya di vê rengê sîyeseta xwe de wê, heta roja me jî wê, vajî wê, weke ku emê li afrînê û rojava bibînin wê li dijî tevgerên

civakê, xwestekên civakî ên weke maf û azadî û statûya civakî a xalkên herêmê wê bibê xwediyê pozisyonek. Di vê rewşê de wê bi gotin û kirinên xwe re rûsya wê, ew dûtîya ku ew dijî û di nava du aliyan de diçêt û dihêt wê, bi zêdeyî wê bi kîjan aliyê ve wê herê wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê dem şanî me bide. Lê rûsya di vê rewşê de wê, sîyeseta xwe de wê, di rewşek û aliyekê ku ew winda dikê de ya. Di serî de mirov dikarê wê, weke aliyekê girng wê werênê li ser ziman.

Dihê dîtin ku rûsya heta roja me jî wê li ser temen û rengê hizirkirinê ê dema yekîtiya sovyet wê, xwe bide jîyankirin. Lê ku wê hem di nava xwe de û hem dervî xwe wê, ew bi awayekê baş û rast ew pêşnexistîya û ne gihandîya şiroveyên rast û di cih de ên herêmî û sîyesî. Ber wê yekê jî ew, nûha di wê de ew bi şûn wê dikeve. Bi wê re jî bi şûn demê jî dikeve. Bawerkirina bi hêza xwe ya leşkerî, teknîkî û biolojîkî û hwd wê, nikaribê bi tenê ji wê re demê bide qizincirin. Hêza desthilatdarî ku ew bû weke hêzek serdest a li berçav li ser serê mirov wê ew wê giranîyê bi xwe re wê werênê. Di dewama wê de wê, weke ku wê di demên berê de jî wê were hanîn li ser ziman wê, di bin giranî û zordarîya rejiman û hêza wan de wê mirov wê bi fatîsê. Wê demê wê mirov jî bo ku ew bi serê xwe bê û ew di bin wê destilatdarîyê de ne fatîsê wê li berxwe bide. Ev wê, çi bide nîşandin? Ev wê bide nîşandin ku ew hêza desthilatdarî ku ew ti carî weke hêzek kifşkar dernekeve li pêşîya mirov. Wê hingî wê temenê rast pêşketinê bi serê xwe wê bibê. Ya ku wê ji aliyekê ve wê, temenê pîrsgirêkên civakan û xalkan bi rejim û desthilatdarîyan re jî bê wê, ew rewşon wan pîr zêde bi serdestî û sehêti û ankû kontrolî ku ew hatîya pêşxistin bê. Bi sînor kirina rêveberîyê û ankû desthiatdarîyê û kirinên wê li ser serê mirov û di jîyane mirov de wê, temenê pêşketinek rast bê. Tenê bi politikayên kontrolkirinê û di dest de girtinê û parastinê wê ti tişt wê newê **parastin**. Rûsya di vê rengê û awayê de wê, weke hêza ku ew di pêşî bi vê rengê di aqilê xwe de û piştê jî ew di sîyeset û jîyane xwe de ew hin bi hin winda dikê. Rûsya ku ew bi vê rengê xwediyê sîyesetê ya wê heta devera ku ew bi leşkerî bihêz a wê, karibê hebûna xwe bixwe jî biparêzê. Wekî din ku ew hêza wê ya leşkerî kêmket wê bi şûnkeve û wê nikaribê pêvajoyek din weke ya salên 1990î a ji hev felişîna yekîtiya sovyet xwe ji jîyankirina wê nikaribê xwe xilasbikê. Parastina statûqûya herêmê li sûrîya, tirkîya, îranê û hin deverên din ên herêmê wê tenê hin berwejdîyên leşkerî, sîyesî û hwd wê, karibê bo rûsya biparêzê. Lê wê nikaribê demê û pêşarojê bide qizincirin. Li vir di aslê xwe de li dijî mudahaleya li sûrî û ankû statûya xalkên wê herêmê a mihtemel ku ew bidest bixin sekinîna wê, tenê temenê windahîya wê ya dîrokî bê.

Rûsya di vê çerçoveyê de wê, di serî de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman ku wê, ev rengê sîyesetê ê piştî ji hev felişîna yekîtiya sovyet li ser temenê pêşbazî û dijberîya sîyesî a parastina hinek berjewendîyan ku wê li dijî amarika avakirîya wê, rewşeka bînavarok û vala bê. Wê ev rewş wê nikaribê ji wê re wê, bibê weke temenekê sîyesî ku ew li ser wê re wê, sîyesetê bikê. Di reng û awayekê bi vê rengê de wê, rûsya bê dûvikê rengê sîyesî. Wekî din jî li ser wê dijberî û pêşbazîya wê re wê, amarika jî karibê wê, ji gelek aliyan ve şaş bide bi rê, awa û rengkirin di sîyeseta wê de.

Di rewşa kosova de jî wê, rûsya wê heman sîyesetê wê bikê. Wê piştî denezendina serxwebûna kosova wê, dema ku wê hêzên NATO û ankû amarika wê bikevina kosova de wê, rûsya wê pêşîya wan wê hêzên leşkerî wê bikê wir û wê qadê bi leşkerî wê bigirê. Li dijî serxwebûna kosova jî wê, weke ku wê î ro wê li dijî statûya kurd a li sûrî wê xwedî helwest bê. Di aslê xwe de wê, ev rengê sîyeseta rûsya wê, ber ku wê di vê rengê de wê,

hin bi hin wê di statûqûyê de wê ji xwe re wê li cih bigirihê em, tenê ku ji dema denezendina serxwebûna kosova û heta roja me şîroveyê pêşbixin em dikarin bêjin ku wê, rewşa rûsya li şûna berjor de diçê wê bi berjêr de wê herê. Ev jî wê, encama rengê sîyeseta wê ya şaş a ku ew li herê mêmê dimeşênê bê. Li vir mijar ne mijare serxwebûn û ankû neserxwebûne civakekê ya. Mijare hebûna civakekê ya. Ku ew civak bo hebûna wê, temenê parastinê bê wê, serxwebûna xwe jî wê denezênê. Çendî rûsya xwediyê serxwebûna xwe ya wê, kurdên rojava jî, yên başûr jî, bakûr jî û rojhilat jî wê, weke wê xwediyê heman mafê bin ku ew bixwezin ew serxwebûna xwe denezênin. Dema ku ew wê mafê ji xwe re rast bibînê û yê din li hemberî xwe re rast nebînê wê, bikeve rewşa statûya metingerîya rejimên herê mêmê de. Ev jî wê, ne tenê temenê windahîya wê ya li derve wê biafirênê wê li hundûr jî wê hin bi hin wê bi wê zihniyetê wê winda bikê. Di serî de wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Li vir, di çerçoveya rewşa heyî de bi awayekê hêsanî hin kesên weke 'şêwirmend' ku ew gotinê dibêjin wê, ji rewşeka nîvçû kifşkirina wê derbas nebê. Ev jî wê, nikaribê li ser wê, sîyesetê bikê û pêşbixê.

